


HEJMAR
2

pîne

%100
KURDÎ

bi pîvazê re jî xweş e



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve 16-31 ekim (kewçêr) 1999 Sayî: 2 500.000 TL

CARNA POLÎS JÎ XWE ŞAŞ DIKINI!..

Li Edeneyê Polîs ji dêvla ku bavêjin ser "hêlîna terorîstan!" avêtin ser maleke bi zar û zêç. Malxwêyê malê Murat Bektaş li ber çavên zarokên wî kuştin.

BIBORIN !..



Xelîq

Bûka baranê: Pîne

Heç kurd be û Pîneyê nexwîne, bila di rojnameya Starê de bibe nûçe...!

Ji xeynî çend kesên ku di "guhê dînazor" de mane, hayê her kesî bi derketina Pîneyê ketiye. Li gorî pistepistnameyê, Pîne wê reyting berztirîn weşana kurdî û kurdan be. Hate ragihandin ku KNK'ê, li dijî Pîneyê dest bi dek û dolaban kiriye û komîsyonek daye avakirin. Lê ew jî zanin ku çu li pêjnê didin!.. Jixwe li gorî gotegotan komîsyonê biryar daye ku beşdarî Pîneyê bibe. Bila werin emê binihêrin!

Berî her tiştî ji Girava Aştiyê kevokeke mesajek bo Pîneyê anî. Basko basko bûbû, lê dîsa jî mesaj gihand me. Digot, "li ber zimanê kurdî rê vebûye. Karê hûn di kin biçûk nebînin û di ser guhê xwe re navêjin.

we silav û hûrme!



ev kulilk ji botan hatî ye

re

Qedrê wê bizanin." Peyre ji derdorên îslamî bigirin heya çepgir, peyam û nameyên cur bi cur, bûn mêvanê namedank û emaldanka Pîneyê. Wekî 'bûka baranê', her reng tê de hebû. Zarokan telefon kir û got, "Dema ez mezin bûm, ezê bibim Pîneçî!.." Xwendevanekê kulîlkeke ku ji çiyayên botanê hilkiyê, şand. Ha yekî ku haya wî ji bayê felekê nîn e digot, 'we çima nivîsa hin karîkaran ji bîr kiriye!' Gelek tiştên din hene, lê ne hewce ye em behs bikin. Dibe ku çavîni bibel!.. Tû tû tû... (hûn dikarin kespikan jî bişînin.)




Dîsa jî name û peyamên ku hatine ne bes in. Ne ku em çavnebar û çilek in, lewre hûn her tiştî ji xwe re dibêjin, du sê gotin, çêr û lomeyan jî ji me re bêjin (ji we zêde ye...!). Hin kesan jî li ser bihayê we antî-pereganda kiriye. Ev tev vir in. Ev kes jî, çahş, sixûr û bolşîci nel? (bila patron nebihîzin rast e! Lê ne zêde. Ma wê dê weledên xwe biavêjin! Şert û şûrt bênamûs in. Wekî din promosyonê me jî wê hebin: zêrên demokratîk cumhuriyetê, nokê Mêrdînê, Ava Sûsê, gera Xançepêkê, zeytûnê Dêrikê, komira Şimexê... Na, em pîvaz û poşiyê nadin.)

"Bi rastî ev Pîne çima derket?" Li gorî ku li ber guhê me dikeve, hin kesê bêdîn û neşûstî, vê pirsiyarê ji derdora xwe dikin. Çimal! Ji ber ku hûn 'tirkmanc an jî erebmanc, farismanc' nemînin, Pîne heye (bila soran û zaza dilê xwe negirin, ev peyv bi tenê mecazek e.). Pîne neyarê kokê tirkmançan e. Bila ew ji xwe re li qulika mîşkan bigerin. Lê Pîne wê wan li ezmanê heftanjî bibînel!..

Di navê de me formên ji bo endamtiya Yekîtiya Zabîtayên Zimanê kurdî çap kirin. Xilas bûn, me cardin çap kirin. Xuya ye emê îmtihanê li Deştê Mûşê çêbikin!.. Şertûşûrtname: kesên guh-anten, çav-zeleskop, ziman-wêrîs, bîr-kompûtur, dil-zinar li ber dilê me şêrîntir in.

Heç kurd be û Pîneyê nexwîne, bila heta hetayê Tûrikê Welat bixwîne (şîna miriyan jê çêtir e.).

Xêzen Bekedani



KANÊ SÊLÊ

LI EDENEYÊ KUŞTINEKE BÊ DARIZANDIN.
QANÛNA KU BÊYÎ BANGA "XWE-TESLÎMKIRINÊ" DESTÛRA KUŞTINÊ DIDE, KETE ROJEVÊ.




SÎBEL CAN JÎ WÊ BIBE PÊŞKÊŞKARA NÛÇEYAN





TUNELA LI GIRTÛGEHA ULUCANLARÊ PÎŞTÎ DEH ROJAN HATE DÎTIN!



LI ZANÎNGEHAN ZORDESTIYA LI ŞER CIL Û BERGAN BERDEWAM E






Small signature or mark.

Sevitsaatci@hotmail.com
XÊZ BERRŌJ
SEYÎT SAATÇI



Small signature or mark.



Small signature or mark.

Argûn



MAHMÛD LEWENDÎ

Nivîs li gorî dilê min bû. Min ji endamên malbatê re xwend, ligel Berfîna me ya dusalî, hemûyan eciband û pejirand. Piştî min ji hin heval û dost û hogiran re xwend.

A çi bû piştî wê bû! Naveroka nivîsa min li kuçe û kolanên bajarê me, olan û yanqî da: "Lawo, Mahmûd nivîsek nivîsiye, li ser diziyê ye, tê de qal û behsa filankes jî dike!", "Behsa diziya kitêba filankes dike!", "Navê kasetaya filan dengbêjî jî tê de heye!"

Û bi vî awayî yek bû deh, deh bû sed. Dizên ku haya min ji wan tunebû jî ji cihê xwe lebitîn û liviyan. Û wele şevêkê, yên ku ji xwe ditirsiyan, yên ji xwe şerm dikirin û li ber xwe diketin, yên ku ji xwe bawer û nebawer, mîna teyrok û zîpikan, bi rîya telefon û faks û e-mailên tijî tehdît, çavtirsandin, ricaname, şermname û gîlîname, avêtin ser mala min.

Ji xwe ji ber cixareyê bîhna min diçike, bi vî êrîşa teknîkî û elektrônîkî re, êdî nema bîhna min derket. Wele endamên malbatê, bi girî û ax û fixan û şîret û penç û nesîhet û daxwazên xwe hatin hawara min.

Piçekî bîhna min vebû. Min cixareyek kişand. Ez fikirîm, ponijîm û piştî jî bîniyîm û min biryar û qerara xwe da ku ezê nivîsa xwe ya li ser "diz û diziyê" bikim du beş. Beşa pêşî (ya li jêrê ye) ezê belav bikim. Beşê din jî li gorî wext û şertan û daketin û hîlbûna hêrs û tengjiya diz û dizdaran, ezê di demên pêş de belav bikim.

Dize-Diz (Beş-1)

Diz ji wî kesî re tê gotin ku rezîlî, riswayî, tûkxwarin, repxwarin, lêdanxwarin, birîndarbûn û heta, mirinê digire ber çavên xwe û xwe di çeper û neqeban wer dike. Îcar her tim dikare bi ser nekeve. Carina dikare welê tê wer be ku êdî nema ji wan çeper û neqeban derkeve.

Tarîxa diz û diziyê pir kevn e. Welê kevn e ku hema hema çi bigire bi destpêka mirovahiyê re ye. Di tarîxa mirovahiyê de dizên pêşin bavê me Adem û diya me ya Hewê bûn. Ji bihuştaya Xwedê sév dizîn (li gorî hinekan genim dizîn). Û Xwedê jî li hemberî alema firîşteyên xwe, ew rezîlî û riswa kirin, bera wan da, ew ji baxçeyê

xwe qewirandin, avêtin vê dinyaya me ya tijî diz.

Axirkê, çîroka wan dûvedirêj e. Jixwe hûn zanin çi bi serê wan de hat. Dizî li gorî qonax û gehînek û merheleya peydabûna civatan bi pêş de çû. Di dewra şikeftan de çerm û post û kevîrên şahîk û şujik û darçoyên hê nebûne çekê çek-daran û hêkên dînazoran ji hev didizîjn.

Piştî civat pêş de çû, îcar dest bi diziya ga û nîr û hesp û hesan û sindan û çakûç û sûr û mertalan kirin. Di nav koçeran de jî dizîya pez û dewaran pêş de çû. Dewran guherî, çerxa felekê çep zivirî, hinekên "zîrek û çavekirî û fersendçî" sûr û mertal û pez û hêkên dînazoran wergerandin pûl û sened û pereyan, navê dewranê jî bû semiyandarî an jî bi gotina gawiran kapîtalîzm.

A çi bû di vî dewranê de bû. Dizî pir bi pêş ket, erd hatin dizîn, zimanê miletan hatin dizîn. Stran û govend hatin dizîn û dizî û dizî û hê jî didizîn.

(Dewama vê nivîsê heye, lê niha ne wexta wê ye, piçekî bi sebir bin, eger Xwedê go erê, pêş de ezê jî

bibêjim erê... Gerçî ez zanîm niha dilê hinek hunermend, nivîskar û şair-maîrên me çarsimkî lê dide. Lê heyecan û lêdana dil ji bo gera xwîna mirovî baş e. Çimkî li gor Hekîmî Loqmanê hevdem, di heyecan û weswese û sawê de xwîna tîr ron dibe. Ev yek jî dibe sebeb, da ku di damaran de, di nav xwîne de bez û rûn çênebe. Her weha ji bo "qanpixtilasmasî"yê jî baş e.)

Eşantiyon

Hin rojname ji bo ku baş werin firotin, maçûna diranan, firçeya solan, çenteyê milan an jî boyaxa solan, wekî eşantiyon belav dikin. Ji bo ku quncika min were xwendin, wekî ruşwet û bertîl, ezê di her hejmarekê de yek du pêkenînan wek eşantiyon li we belav bikim. Fermo ji we re eşantiyona vê hejmarê:

Zebes

Zebes nîşanî serokekî kurdan dan, got: "Ev kundir e!"

Nîşanî serokekî din î kurdan dan, got: "Na, petêx e!"

ÊRÎŞEKE ELEKTRONİK

Di hejmarê pêşî de min gotibû, ezê li ser diz û diziyê binivîsim. Lê, nebû!

Hûnê bibêjin çima? De ka hem bisekinin û hem jî rawestin, ez ji we re bibêjim.

Min nivîsa xwe amade kir. Min çend caran xwend. Min hin tişt jê derxistin û hin tişt jî lê zêdekirin.



Haydar IŞIK
Dayê

Navenda henek û qerf û qotikên Kurdistanê Cilînê, yek ji sî û sê gundên Sûrgiciyan e. Dîroka wê pir kevin e. Girêdayî Ewênaya ku bi Sitewrê ve ye. Cilînê, di navbera Bismil, Sitewrê, Şemrex û Çinarê de ye. 20 sal berî niha li dora 600 malî bû. A niha li dora 250 malî maye. Gund axa lê tune bûn. Çend heb ezbet hebûn û her ezbetekê odeyeke wan hebû. Şevbûhêrkên xwe li wir dikirin. Herkes diçûn mala mezinê ezbeta xwe.

ŞEVBUHÊRKA CILÎNIYAN

Ev biwêj li gelek herêman, ji dêleva şevbuhêrkên, piştî saeta raketinê, tê bikaranîn. Piştî 10-11'ê şevê gava ku li gundan herkes diçû radiketinê, wan digot, "Filankes gayek an kerekî wî yê firotinê heye; ew ji xwe re dikirin mane, ji bo ku şewr pê xweş bibe. Biwêja "Şevbuhêrka Cilîniyan" ji vir tê.

Ji ber dijminahiya eşîrtî ya naxweyî, ku 25 sal berê dest pê kiribû, gund ji 600 malî, daket 250 malî. Ji sala 1980'î vir de bêrê û bêav e. Ava sarincê ya baranê vedixwin. Dewlet gelekî li ser sekinî û tade lê kir. Xwest ku wan bike cerdevan, lê gundiyan red kir. Sala 1997'an de di navbera wê û gundekî din de serbazek hate kuştin. Dewletê xwest ku bixe stûyê gundiyan. Leşkeran girte ser gund û gundî gîşk ji malên wan derxistin. Leşkeran çî zêr û zîv û pereyên hebûn, gîşk talan kirin. Dewar û pez ketin hundirê malan, zad xwarrin gelek jê tengjiyîn, mirin û pasê 40-50 zilam girtin birin 10 rojan li wan îşkence kirin û ji gundiyan xwestin ku herkes çekekê bîne. Yê ku tune bû jî kirîn, deh kes ji gundiyan girtin, pasê ji wan çekan çend heb, gule pê berdan û ev çek birin dadgehê û gotin pê gule hatiye berdan û wan pê serbaz kuştîye. Çend kes ji wan hîna jî di girtîgehê de ne.

Çend sal berê bîr kolan û dikira ava wê çêbikirana, lê

"Ma hakim beg heta ku negihê îstasyonê trêna disekine?"

dewletê hat noqavê (dalgîç) wan ji bîrê derxist û nehişt av çêbibe.




Kana Qerf û Qotikan: CILÎNÊ

TRÊNA SÛRGICIYAN

Rojekê ji cilîniyan hin kes diçin Amedê, çav li trêna dikevin. Vedigerin gund û dibêjin "ka em jî ji-xwe re trênekê çêkin." Cihê Cilînê kort e; di navbera çar çiyayan de. Xwe bi hev digirin û wekî trêna xwe ji çiyê ber bi gund ve berdidin. Dibêjin **guf guf guf...** Li nav gund zarok tîna pêşiya trêna, li wan nasekine, pê li hinek zarokan dike û hin jê birîndar dibin.

Xwediyên zarokan diçin li wan gilî dikin. Di dadgehê de hakim dipirse, dibêje: "We çawa trêna çêkir û çawa li zarokan qewimî." Ew



jî dîsa xwe bi hev digirin û dibêjin **guf guf guf**, xwe li hakim û mase û kursiya wî diqewimînin, gîşkî diqulipînin. Hakim dibêje: "Hûn çima li zarokan nasek inîn?" Ew jî dibêjin: "Ma hakim beg heta ku negihê îstasyonê trêna disekine?" Li ser vê pirsê hakim dibêje 'na' û wan serbest ber dide.

JÎRIKÊ SÛRGICIYAN

Wekî mesela ku dibêjin, "çû heyfa bavê, qûna dê li ser kir", ji bo kesê ku ji dêleva çêkirinê, tiştan xera dike, tê bikaranîn.

Rojekê deve (hêştir) dikeve nav pembû, gundî neçar dimînin ku wê çawa bê zarar deveyê ji nav pembû derxînin. Bang li jîrik dikin. Jîrik dibêje, "Her çar nigên wî girêdin û wî bi xwêr re bikişînin."

NIGÊN TEVLİHEV

Çend sûrgîcî li ser devê bîrê rûdinin û nigên xwe pê ve berdidin. Solên

gîşan ji hev in. Yekî biyanî di vir re derbas dibê. Nêvî ji quretî nêvî ji kawikiyê dibêjin, "Ha rêwîyo! Ka were, nigên me tevlîhev bûne, em nema ji hev nas dikin." Rêwî lê hay dibê ku çî kawik in. Radihêje darekî û li binê nigên wan dixê. Her ku dar li nigê yekî dikeve, diqîre û nigê xwe dikşîne. Pasê dibêjin, "Mala te ava! Ku ne tu bûya, nigên me wê tevlîhev bimana."

Eke vore şiyene gilê koyan, hêligê sing û kenger ke vejyênê, dayê to vatêne: "Xojive mavû, emser jî domen xeleşay." Dayê dilê to dirvetin, çimanê to de herdis, loqmê gula to ra nêşiyene. Tertele Dersîm de to vatene:

Koyê ma bîvî kêwêy, esker amey. Eskerê romî amey, dorme qomê ma gurêt, dar û ber, bir û kemer bî gêwr, day vera koyênê Dersîm ser. Eskere Romî qir kerd, est ve tija amnon, dest bojtî guret sarebirnay. Verê lingone Duzgin de. Dewa Kalmem û Gêre de, Dêre Qil de, Kemere Şa, û Dere Laç de day vera makîna.

Duzgîn bi ker û kor, veng cira nêvejîya. Cutir nêwêneno? Na bêbexten çik a? Honde xizmete, haq adire torê, kot menda, topê to kote? Cira tora veng nêvejîya? Eşîrê kirmanc zûvîn ra girêday, ardî Kalmem. Dima jî kofî kerd arêy. Milet kofî ra girêday, qaz est ser, adir navi pa. Axe dînan şî Hewsa Duzgîn, bîra bêrz şî asmen.

To niyada, eve dilê dirvetin. Zêre to deza, herdişê to cemeday, cizikê to bîvî huşk, laze to berva. No ci hal bî. Kirmanciya belekê werte adirê Romî de ra. Goniya millet hêgay kerd sûr. Aye ra dime dilopane çimone to, bîvî katixê to, zerê to dirvetin, dilê to dervetin. Çimone to ra lesar şî, derdê milletê bêwayir.

Şilemanê Saqulî, Yemen de, Hîesê Bom Sakarya de, Kalî Çavus Kafkasya de. Bom, bakil cenc û kal pêrin eve havatîn xebatî kerdê. Kalibolî, Trabulusgarb, Dumlupinar, Sankamisî, şer kerd. To fam nêkerd ke, torinê deleverge dostanê xo çina, dismenêna xo ku Tertele Dersîm û qatîlam o.

Dayê, qirkerdene berde-wam a, le ewro Kirmanciye bêleke niya. Tornê to jî milletê waxte to niye. Nika biye cûn, asireten werdera.. Dêwre Qemo Heyderiz, Mamede Areyiz, Axaye Cuxire û Lolu wêdrda dayê. Tornê to bê heval, dave tê herme, nika hêgayê sûr, Hewsa Duzgîn, Gile Zele de fetelîne. Roye to lêwerdero Dayê.

dilistan

Can Yücel (1926-1999)

Şair û nivîskarê Tirk Can Yücel di 1926'an de li Îstenbolê ji dayik bûye. Kurê Hasan Alî Yücel e. Li Ankarayê di DTCF (Fakulta Ziman, Tarîx û Coxrafayê) de beşê Filolojîya Klasîk xelas kiriye. Piştê li Îngiltereyê di Unîversîteya Cambridge de xwendiyê. Demekê li Londrayê di radyoya BBC de kar kiriye. Piştî ku vegeriyaye Tirkîyê li Bodrumê ji bo tûristan rehberî kiriye, paşê li Îstenbolê bi çîb bûye û di karê wergerê de jiyana xwe domandiye. Helbest, werger û nivîsên wî bi piranî di kovarên Yenilikler, Beraber, Seçilmiş Hikayeler, Dost, Sosyal, Adalet, şiir Sanatı, Dönem, Yön, Ant, İncece, Papirüs, Yeni Dergi, Birikim, Sanat Emegi, Yazko Edebiyat de derketine.

Piştî salên 1965'an Can Yücel dest bi nivîsên sîyasî jî dike. Wî di helbest û nivîsên xwe de bi piranî ironîzm, "mîzaba reş" û bîciv bi kar aniyê.

Berhemên wî: Yazma (1950), Sevgi Duvarı (1973), Bir Siyasinin şiirleri (1974), Ölüm ve Oglum (1976), şiir Alayı (1981), Rengabek (1982), Gökyokuş (1984)

Her çendî wergerandina helbestan zehmet e. Û tew bi ser de şair jî Can Yücel be, zehmettir dibe, lê dîsa jî me hevl da xwe, me çend helbestên wî jî Tirkî wergerandin.

XIYARAR Î

Ez dibêjim "xiyar"
Dibêje, "na, ez turşî me!"

HELA BINÊRE!

Her tişt buye xurde
Lê dîsa jî li ortê perê xurde tuneye!
12 Adar 1980

ŞITIFÎN*

Dema ku bi tenê dimînim ez,
Yanê gava ku Güler ji min direve
Hemû lambeyan vêxistî dihêlim bîst û çar saet
Du radyo hene, herduyan jî vedikim ez
Nanekî tam dikirrim li şûna nîv nanî
Û "Îro mastekî mezin bide min" dibêjim ji dikandar re

Yê ku bibîne wê bibêje qey dawet heyê!

*Şitîfîn: Di maneya "kaçamak" a tirkî de hatiye bikaranîn.

JI DEVÊ KURT AHMED*

Bavê min bi rastî zîrek bû
Ezê di demeke herî nêz de xelas bim lawê min! digot
Ji vê cehaletê
Ezê xelas bim, lê
Ku şûna wê bi tiştêkî din danegrîm?

"Zarokê No" yê helbesta tirkî Badenoş Baba CAN!

*Kurt: Gur

JI ME RE JÎ DIBÊJIN ÇEQOKÊŞ
Her tim tebeşûr di bêrika min de ye
Dema ku li kolaneke mûtêna

Li ser deriyê baxçeyê
koşkekê



Rastî wê lewha

Dîqqet (du nuxte li ser hev)
DI VÊ MALÊ DE
KÛÇIK
HEYE
têm, bi herfên mezin
RAST E

dinivîsim.

Çavkanî:

- Kurdakul, şükran; şair ve Yazarlar Sözlüğü, 1985, İstanbul, r. 669
- Batur, Enis; Kara Mizah Antolojisi, 1987, İstanbul, r. 148
- Yazko Edebiyat, (kovar), İstanbul, No: 10 (1981)

Amadekar û Wergera ji Tirkî: Mahmûd Lewendî

HENIK

Ev kotir fenaî îskeîska beyaniyê ne
Pepû pepû bi wê de dixwînin
Di hilma hişkî ya esmên de,
Bi ro jingên periyân,, bi helesorên mitirban re
Dijijilin yanzdeh mehan
Ber bi çiyayê xalî yê li pêşber, dûr
Ku xeta wî xetatê mezin
Yesaarî xêz kiriye....
U behîv diçeşin
Ça ji nêzîkl...
Tu li îşê ecêb ê xwezayê binêre!

HOGIRE MIN REVIYA DERVE

Zarok im ez
Min yekem car dît, çav bi siya xwe ketim
Ez bi kû de ew bi wir de
Li çepikan didim li çepikan dide
Dikenim dikene,
Geh ji min mezintir dibe geh biçûktir,
Ji kû hat, qey wê carin here?
Çû jî, çawwa ku pîrika min derî vekir,
Jinika ter'îkî bo çi fam nake ez digirîm!

REMEZAN

Dema fitarê, ku mirov xwe bikuje
ma rojiya wî betal dibe?

NUTÎ

Piyê min diêşe
Piyê min, pêçiya beranê ya piyê min ê çepê
Dinya diêşe
Dinya êşek e,
Ger ji aliyê Xwedê ve hatibe afirandin
Çewt hatiye afirandin,
Emê dinyayê ji nû ve biafirînin

JI HOGIRA ECEM FURUXE RE

Tu jî mîna min î Fûrûxê,
Dixwazî bi her tiştî bimirî,
Bi her tiştî re bivejî
Lê serê her deqeyê pêk nayê ku ev!
Pêk nayê da!

*Fûrûx: Helbestvanekê navdar e Ecemistanî.
Wergera Kawa Nemir



TAQ


Weşanên kurdî û li ser kurdan

- * Leyla û Mecnûn Swadî Nûbihar
- * Dîwan Seyid Eliyê Findiqî Nûbihar
- * Janya (helbest) Rênas Jiyân Doz
- * Reş û Spî (roman) İ. Seydo Aydoğan Doz
- * Li Ba Me Li Wan Deran (çîrok-werger) M. Margosyan- Avesta
- * Sobarto (roman) Helîm Yûsiv Avesta
- * Marê Di Tûr De (roman) Medenî Ferho Pêrî
- * Di Siya Dara Xaçê De Serhildan (helbest) Miraz Ronî Pêrî

- * Karkerên Nonî (werger) Maksim Gorki Tij
- * Çirokên Kurdî Feqî Husên Weşanên Enstutiya Kurdî ***
- * Kürt-Türk İlişkileri Üzerine Barış Ve Demokrasi Konuşmaları 1988-1999 Abdullah Öcalan Aram
- * Kürt Aşkı Abdullah Öcalan Aram
- * Susturulmuş Çıglıklar Tomris Özden Bumerang
- * Bir Kolektif Bilinç Olarak Milliyetçilik M.Bostancı Doğan Kitap
- * Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi ve Gelişmesi W. Jwadih İletişim

Ji bo alîkariyê spas ji Pîrtûkxaneya Medyayê re


HES O XÊV



TI SENI AMEYA OINYA
TIYA MERAG KENA ?..
A TORÊ BIKE QAYTIKE!..

EZ ZAN NÊKENA
TI MAYA MINA NINAN
KENA! LAWO..LAWO!


IIRAAHH!.. HUH!..
DAS!.. SÖNN!.. AAYY!
YAH!.. YAH!..



"ISMAIL ?
EZ QIDA
TO YA ?..


LAAAW! ERO TO
SENI EZ NAS KERDA
Hi..Hi..HO..HO!..

ZOOORRT!..
BIRRT!..
PSSS!..



HELE BEVNA
QAYTE ŞANSE NEY.
MIN HARO ANCIYAYIS
OÏ SE BÎ ?..

DONG!



AHAAL!..
WILI MIN
ÇIYÊ DI!..

ÇOTANK!

GÜM!..



MAYA TU JÛ HURIBE
BÎ. BERXE MIN!..

NE..NE..TI ZÛRI
KENA BAWO...
BUHU..HU..HU!..




LAWO LAWO ÇITE
PIRÊSYÊ RIYE MI RAL
TEVAYÊ NÊVINENA!..





JÛVVVVV!..

VÛJJJJ!..

HELE QAYTE KE !..
EZ DESTANÊ XO VIREDNA
RAYINA ŞONAL..

WISS!..
BAWER
NÊKENAL





DANEZANA MAFÊN ERZANAN



TARA BÊJINGÊ

CEMİL DENLİ

A- Bi Gişkîn Mafên

Kurdan:

1- Mafê her kurdî heye ku sewsî, gêj, kawik, dewx û xewarî nemîne.

2- Mafê tu kurdî tuneye ku sewsî, gêj, kawik, dewx û xewarî bimîne.

3- Mafê her kurdî heye ku derdê eşîran nekişîne.

4- Mafê her kurdî heye ku kokên daran nexwe/nequmîçîne.

5- Mafê her kurdî heye ku bi tiliyan nekeve pozê xwe.

6- Mafê her kurdî heye ku tif neke erdê (mafê wî heye ku tif neke hewa jî, ji ber ku tif li hewa nasekine, tê erdê).

7- Mafê her kurdî heye ku li hember pêşketinên dinyayê av ji deva neçe.

8- Mafê her kurdî heye ku ji pîvazê hez bike/biçîne/bikire/bifiroşe.

9- Mafê her kurdî heye ku silavê li hemû qanûnên li dinyayê hatine pê neke.

10- Mafê her kurdî heye ku bi slogana "biratiya gelan" xwe nexapîne.

11- Mafê her kurdî heye ku "li ber tayê tolîkê" nereqise.

12- Mafê her kurdî heye ku bi zimanê xelkê, bi xwe nekene.

13- Mafê her kurdî, her demê, bi her awayî, heye ku dostaniya xwe bi reşbelekê re geş bike.

B- Beş bi Beş Maf

a- Mafên Jinê

1- Mafê her jinê heye ku her sê telakên mêrê xwe di dest xwe û wî berde.

2- Mafê her jinê heye ku bêyî daxwaziya dê, bav, bira, malbat, eşîr û yezdan û hwd. bi kesê ku dixwaze re bizewice/nezewice.

3- Mafê her jinê heye ku bi hewiyê neyê ser/mêrekî din bike.

4- Mafê her jinê heye ku berçem berçem biçe/benîşt biçû.

5- Mafê her jinê heye ku derdê jineke din (xwesû û hwd.) nekişîne.

6- Mafê her jinê heye ku zarokan cot bi cot/fer bi fer bîne/nîne.

7- Mafê her jinê heye ku bi mêrekî di navbera musulmantî û materyalîzmê de asê bûye re, nezewice.

8- Mafê her jinê heye ku bi jineke din neyê firotin.

9- Mafê her jinê heye ku ji xwedê bawer bike, dînê xwe biguhere/neguhere.

10- Mafê her jinê heye ku ji xwedê bawer neke (mafê xwedê jî heye ku ji wê bawer neke).

b- Mafên Mêran

1- Mafê her mêrî heye ku bêhna sîrê ji devê wî were.

2- Mafê her mêrî heye ku bibe mêrê xerab.

3- Mafê her mêrî heye ku bi jineke di navbera gund û bajêr de asê bûye neyê ser.

4- Mafê her mêrî heye ku feodal bimîne.

5- Mafê her mêrî heye ku xwe wekî demokratek pêşkêş bike û wekî axayan bijî.

6- Mafê her mêrî heye ku di hembêza heftê horiyî de razê.

c- Mafên Zarokan

1- Mafê her zarokî heye ku ji "girarê" re bêje "garê".

2- Mafê her zarokî heye ku ji fikr û ramanên dê û bavê xwe bi guman be.

3- Mafê her zarokî heye ku bi ya mamoste, melê û keşe neke/neçe mizgeft, dêr û dibistanê.

4- Mafê her zarokî heye ku bi leglegan neyê xapandin.

5- Mafê her zarokî heye ku hîni bersîva pîrsa xwe bibe.

6- Mafê her zarokî heye ku bi şîretan biçûk neyê xistin.

xistin ■



"Spor a Kurdan
li Rojhilata navîn"

DİKO



dayê
Çare ne bi
Koçberiyê
ye...




Bijî
KURDISTAN
lê Piştî ku
Perê xwe
bistînim

DİKO



BIMRE
SERÊ QIRÊJ
BIJÎ
AŞTÎ

DİKO



RAST E EZ
Kurd im lê Bavê'm
ji MANGOLIYA û
TIRKMENISTANÊ
HATIBÛ

DİKO

Ji Raya Parçeparçekirî Re



MAR PÊ VEDE JÎ RANABE

Difikirim! Weke saziyên Kurdan, me heta niha çend daxuyanî li çapemeniyê û li raya neparçeparçekirî belav kirine? Ji bo demokrasî û aşitiyê, piştî binçavkirin, zilm û zora dagirkeran û her cure buyerên civakî.

De îcar ka werin em bipirsin, tesîra vana li ser raya giştî û parçeparçekirî tevde çî ye?

Daxuyanî helbet ji hêlekê ve, di derheqê bûyereke qewimî de agahiyê dide raya giştî. Lê ji hêla din, heke armançek daxuyaniyê ji sazkirina reaksiyonên li hember zilm û zora ku bi ser me de tê be, em dikarin bibêjin ku di vî warî de tesîra daxuyaniyan hema hema hîç tune ye.

Li ser vê meselê, em nivîskarên Pîneyê jî ketin nav lêkolîneke zor û zehmet. Me li çîhanê tu pirtûkxane sax nehîst û em di nav "e-mailan" de hinekî gevizîn. Me got gelo çima daxuyaniyên me wiha bê tesîr in. Di encama van lêkolînan ku me tevî Zanîngehên Boxazîçî, Harvard û Yaleyê kir de, daxuyaniyek ku sed û bişt û du sal berê hatiye nivîsandin, bidestxist.. Tiştê ku me ji daxuyaniyê derxist ew e ku xwediyê daxuyaniyê jî saziyêke me ya ku li ser çand û hunera me radiweste ye. Daxuyanî li ser êrîşek qazeskerên Evdilhemîd hatiye nivîsandin. Bûyer bi vî awayî diqewime;

Di sala 1877'an de qazeskerên Evdilhemîd davêjine ser vê saziya me û çar hunermendên me yên hêja digirin, dibin. Li ser vê, berpîrsên saziyê jî vê daxuyaniyê didin. Navê vê saziya me li cem me veşartî ye, lê bila tiştêk neyê ber dilê we. Ku hat jî avê vexwin.

Ji ber ku hûn tiştêkî şaş fêhm nekin û ji ber ku di vê rûpela me de çîh zêde tune ye ez tenê parçeyekê vê daxuyaniyê bi awayê wê yê orijînal pêşkeşî we dikim;

(Ji Raya Parçekirî û Mecmûayan û Teb'aya Reîs-ül Dewleta Osmanî Re...

"Reîs-ül karî yenîçerî el Mehmed-ül Evdilhemîd, bi awayekî biçare Qudret-ül İdara xwe li ser me îzhar kiriyê. Çend biraderên me yê tembûrwan, govendkar û temsîlkar hatine zeptkirin. Biraderên me ev çar roj, yanî nod û pênc saet, pênchezar û heftsed deqîqeyê mûhîm û sêsed û çil û du hezar saniyeyê xwedanqîmet di bin zeptê û derc û derbê de mane. Çend mecûya û qewanên me yê tomarkirî jî bi awayekî bê maal û bê memnûniye zept bûne.



Fîlîheqîqet dewleta ehîl Osmanî bi vê vechîleyê, ji takamûlat-ül medeniyetê dûr ketiye.

Ev mentiq-ül zalimane, wek derbeyî îlahiye li ser hiqûqa esasî wiha li ser serê me derc bûye. Qazeskerên Evdilhemîd, çar biraderên me, bi zalimane birine cadedeyî wetan. Mefhûm û muhîmmeta Caddeyî Wetan li ser me nikare teceddûd-ül îctimayê mezhar biket. Lê divêt bête zanîn, yek zerre-î nef, merhamet di vê derbê û cerbê de nîn e. Merhemet ji dilê me demeketiye. Lê mixabin, li cem biraderên me hîcran-ül husran pêk hatiye. Yek ji wan, Mudîreya me Babanzade Stênik Hurmet, ê din jî ji îdareyî meslahata me û ji efrada Harrûn-ül Reşîd, Yemîlxan El-Eyûb El Melîk ku ji mensefî Farqîne têtê nasîn e. Halîhazir dewleta ehîl Osmanî, bi derbê cerd dixwaze me di nav kabûs-ül cehaletê de bihêle û me ji zumreya Kurdî tecrîf biket."



"Bîlcimle bi zirx û zend û binper İnan ji me ra bi şûr û şesper"

Û di dawiyê de jî, her çiqas em nizanin çima ev beyt hatiye dawiya vê daxuyaniyê jî, lê bi beytek Ehmedê Xanî dawî li daxuyaniyê tê.

Dibe ku saziyên me bawer nekin ku daxuyaniyek bi vî rengî heye! Hûn zanin! Hela ka em binêrin bi vî awayî em dê hêj çendîn sed û bişt salên din di bin zilma qazeskerên Evdilhemîd de bimînin!



MIROV DIBÊJE GEY TU WESTIYAYÎ YÎ. GAVÊN TE TÊN GRAN, TU NIKARÎ WAN VEKIRÎ BIHÊLÎ. HIL Û PÊYEN GRAN DIBIL TU NIKARÎ WAN BLEGÎNÎ. TU KUHA DI-GÎ ZAROKATIYA XWE... HWD.



PSIKYATRIST DR. GEMSID BENDER.

peyjarê



gotina paşyan

Kurd pir qeşeng in!...

Vivet Kanetti (Ji Kovara Fesadê)



GIRARA QEREÇYAN

HELÎM YÛSIV

Aştî û Em

Bangên kurdan yên ku ji bo aştî, biratî û wekheviyê bilind dibin, ezman û erd bi hev re qelaştine. Lê aştî bi kê re û deng diçe kê û haya kê ji kê heye? Li hemberî her bangeke aştîyê, dewleta tirk kîsekî reş dixîne serê serokekî kurd û wan diavêje zindanê demokratiya pepûk. Lê nizanîm çima, her dem ev rewş çiroka Mele Nesredîn tîne bîra mirov; dema digot, 'nêvî çûye maye nêvî.' Çirok jî wisa tê gotin ku Mele Nesredîn biryarek bêvegê dabû, ku qîza qralê welêt ji lawê xwe re bixwaze û diçû û dihat. Li civatan digot, nêvî çûye maye nêvî. Digot, "Ez 'bavê zavê' û lawê min 'zava' û jina min 'diya zavê'. Ev nêvî çû, em her sê razî ne û vê yekê dipejirînin, tenê maye nêvê din. Qral 'bavê bûkê', qîza qral 'bûk' û jina qral 'diya bûkê', ev jî nêvê din e. Ger gotin erê, mesele wê here serî.

Meseleya me û aştîyê jî bûye mîna vê meseleya Mele Nesredîn. Vêca, her wiha em bi aştîyê razî ne û maye nêvê din "dewleta tirk". Gelo nêvê din li

hemberî nêvê me çi dike? De ka li rewşê binihêrin, ku rewşa dewleta tirk ne Girara Qereçyan bi xwe ye. Ji aliyê gundê me tarûmar dikin û dar û zevî û gihayê me, welatê me dişewitînin, û bi tanq û topan digirin ser keç û xortên me yên ciwan û dixwazin çiyayên welatê me seranser daqurtînin. Ji aliyê din ve jî serokdewletê wan, bi nemayî û sivikayî û xweşkayî û hema hingiv ji devê wî diherike, bi peyva demokrasiyê re. Ji hin aliyên dîtir re, bi fedî be jî, nema dikarin kurdan bikin 'tirkên çiyayî'. Li aliyê din jî qala rahîştina "rewşa awarte" dikin; hem îslamê gur dikin û riyên "cînetê" bi her awayî li ber "misilmanan" vedikin û hem jî desmala serê jînekê kirî bûbûya sedema ku artêş û general dakevin kolanan. Lê hemû rê li ser yek xalê têne cem hev; ew jî jîholêrakirina neteweya kurd e. "Nêvê" me bi qîr û hawara aştîyê û biratiyê guhên-keviran qul kiriyê. Û "nêvê" wan jî, bi ser û kuştin û berdewamkirina zorê, hest û wijdanê keviran dihejîne. Vêca werin û vê girarê ji nav hev derxînin û geştê aştîyê bidin alî!..: aştîya berxikê malê û gurê boz. Dibe ku xebera Mele Nesredîn be jî, ku nêvî çûye, lê ew nêvî ne bangên aştîyê bin, lê "devê tîvinga mor be" û nêvê mayî jî, yan di nava gelê tirk de Beşikçi pir bibin. Lê hema nêvê din jî, bi gumana min, dîsa li cem me ye. Vaye 2000 sal bi ser zayina pêxember Îsa ketin û hîna jî hêz tenê dikare rîya aştîyê veke.

FILÛTO...

Abdulkadir ÇIŞEK




NALETBE!
TU DIBÊ QEV EV
ŞEŞEVOK
MIN TAQÎB DIKE

JI XWE DERENG
MAME CAMIYÊ.
MIN EZBERA XWE
JÎ NE KIRIYE
TOBE
TOBE!

PAP!
PAP!

OXI! ŞEŞEVOK WINDA BÛ.
TRO JÎ HER DER
SOSRET KUVA
DIKE.



BISIMÎLA!
ÇI BÛ?

SCREE!



NALET
BÊ ŞEY TAN!
GAVA KU
QURAN JI DESTÊ
DIKET GELO ME
KIJAN DUA
DIXWEND

PAP! PAP!



VAMPÏRELLA

BE LÊ
Û ŞIYA MIN A
ÎŞEV TU YÎ

LÊ TU
MIN NAS DIKÎ
TU ZANÎ
EZ VAN TIŞTA
BÊ DIL
DIKIM



MIN NEDIXWEST KU
XWÎNA XWENDEVANEKÎ
XWE YÎ WEKÎ TE
VEXWIM.
LÊ DIVÊ EZ TÎNA
XWE BIŞKÎNIM

BIBIBI!



BIBORE..
FLÛTO!

EV MACERA
LI VÊ DERÊ
DIQEDE



DUA XWE
YA DAWIN
BIKWI NE
FLÛTO

TU...
TU!



HAH-HAH! NA
VAMPÏRELLA...
HEYA NEHA MIN
EWQAS FÎLMÊ
VAMPÏRA
TEMAŞA KIRIYE

JÎ RO TE
SURPRÏZEKE
MIN HEYE.



BICEHIME

TU NE
AÎDE
VÊ
DINYA YE
YÎ



EV...
EV...
AZAN

EVQASÎ
PROPAGANDAYA
KRÏSTIYANIYÊ
BES E...



NAA!..
MIN
NEDIXWEST
VÎ TIŞTÎ
BIKIM



TOBE
ESTEFILA!..
EZ...
EZ!..
MIN GAWA
EW TIŞT
KIR!..





EW FÎLMÛ ÎEZEROMAN
TEV PROPAGANDAYA
KRÏSTIYANIYÊ
DIKIN...
VAMPÏRELLA BIXWE
GOT...



SUPERMÊN
DILEYI ZE
FLÛTE
MIN...
TOBE
ESTEFILA
...



XEZÊN TÎPÊN TAYBET
 CEMAL ODABAŞI



Pencereya Peyvê



Teşiyên Mijê

Li balefirxaneyê demê,
 dema ku hişê demê di
 çavên bendemana min de
 dem digirt. Li ser sînorên
 wê velerzîna ku ji
 rewrewkê dipijiqî, min tu
 hambêz dikirî, min destên

◆ **EHMED HUSEYNÎ**

xwe li ser milên te ji bîr dikirin û min asoyên bagera paytextan, di bişîrîna te de vedişartin. Ez nêzî birîna te dibûm, nêzî sira bayê felekê û semageriya gulgenimên matmayîna te dibûm, nêzî ferhenga taristana dilê te û barana peyvên mirî yên li ser lêvên te dibûm.

Min gazinên te vedixwarin û min tiliyên sibehê, yên ji xunava pîrsan, di hinarkên te de radiçikandin. Min qîrîna xwe, rivîn û şîn û rûpelên nalîna xwe, xewn û xwezî û berdegehên birîna xwe, mirin û talan û ji hevketina rex û alî û kevî û kenarên zemîna xwe, li ber destên te radixistin. Min nehvirîna xwe, ji gewriya zuha ya dîroka te didizî û dîsa, bi dizî, min xwe diavêt agirdanka bend û şîretên te.

Kêlên bêzar ên hişê min û te û barana bêrikirinê li hev dibaniyan. Hêlîn bi hêlîn, kevir bi kevir, axîn bi axîn, gav bi gav, em ber bi rakêşana sermedî ya jena paytextan ve dihatin û me li şûnşopa demê, me li xwe û li lezgavên rêwiyên bêhûdeyîyê temaşe dikir.

Gula ku di koşeya dilê min de hînî xatirxwestina heval û destbirakan, yar û hogîran bûbû, gula ku di goristana çavîrêmanê de, kêlikên vegera şehîd û xoşewîstan dixwîne, gula ku di destê mirinê de hînî jiyânê dibe, aniha, wek nîmebarana paytextan û xwekustîna sirûdan û reşgirêdana dayikên serdemên çîyan û pesar û gundan, mişextiya min û te radipêçe, û navên me di avjîna mirîna xwe de dinivîsîne.

De hil be ey şîngirîya dayika min!
 De di nav dermanên gizingê de bigevize, ey hişê ku ji gîhayê qonaxan hatiye ristin!

De teşiyên xwe yên ji mijê birêse, ey paytexta ku bi xwîna cigareyan penaberan diçûrise!

Li balefirxaneyê demê, dema ku dem di navbera min û te de dilikumî, min bi destê êşa xwe digirt û min dida pey tîrêjên maça te. Min mirîna xwe haş dikir, min stranên xwe yên şewitî, pêşkêşî awirvedana qedere dikirin, min kajên sînga te, ji ber bagerê didan alî û min kurtepista xwe di guhên te de dikuşt.


Destê sibehê, beriya banga dîkê taxê, ez dê pasvanên bajarekî ji toz û xweliyê, bi qîrîna xwe veciniqînim û asoyên lixwemikurhatinê, bi kulîkên xemgîn ên balefirxaneyan bixemilînim.

Ez dê berê xwe bidim duryana bêdengiyê, qehweyekê vexwim û çigareyêke ji jehrê bikişînim û li PAGANINI guhdarî bikim, tembînameya xwe bi ximava paytextên xwêlîng binivîsînim û ez dê xwe dahêjim bîra serbir a bîhokên kenê te, da ku hemû pencereyên dilê xwe di rûyê mirinê de bigirim û hevalbendiya giriyê sermedî di giyanê xwe de biparêzim.

Ez dê ji te re, ji xwe re, ji pinînikên oxirê re, ji dengvedana oqyanosan re û ji qedere re jî "Lêlê lê dayê, de bila porê serê me herem û xatûnan kur be, li ser dewrana darê vê dinyayê.." bibilînim.

**

Lêborîn: Hefteyê çûyî, me navê nivîskarê xwe Ehmed Huseynî nenivîsîbû. Em ji Huseynî û xwendevanên xwe lêborînê dixwazin.



M A M e a n K



Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li ser ragihandina ebûqatên xwe, bo Pîneyê ev peyama şandiyê:

"Daxwaza min a serkeftinê ragihînin wan. Bila girîngiyê bidin xebatên bi vî rengî. Di nava têkoşîneke mezîna de rê li ber zimanê kurdî vebûye. Bila biçûk nebînin û di ser gubê xwe re navêjin. Bila heqê wê bidin. Ew, berbema xebateke sedsalekê ye. Bila baş binirxînin, qedrê wê bigirin."

Gelek, bi tenê, dikare bi ziman, çand û avaniya xwe ya civakî li ser piyan bimîne. Gelekî ku zimanê wî li ber tunebûnê ye, çanda wî hatiye talankirin û avaniya wî ya civakî jihveketiye, ne bi kêrî xwe, ne jî bi kêrî mirovahiye tê.

Rewşa gelê kurd, ku li ber dijwari û zordariyên sedan salan li ber xwe dide û têkoşîna vejîne dide, dişibe serpêhatiya Teyrê Ankayê, ku ji nava xweliya xwe vejîyaye. Di nava vê têkoşîne de, ev xebata ku we pêk aniye, bi tîra xwe watedar û manîdar e. Ji we re serkeftinê dixwazim û ji Pîneyê dibêjim, "tu bi xêr hatî!"

Ferzende Kaya
Edîtorê Mafên Mirovan yê Selamê

Ji ber vê xebata we, ku wê bo çanda kurdî tevkarîyeke girîng be, ez we pîroz dikim û di xebata we de serkeftinê dixwazim.

İrfan Mantaoğlu/Girtîgeba Ermenekê

Du zarokên penaber ê kurd nîqaş dikirin. Yekî ji hevalê xwe pirsî.

- Ma tu dizanî Pîne çi ye?

Hevalê wî tinazê xwe pê kir.

- Vê pîrsê biçê ji çêleka gundê me menteşiyê bipirse?

Pîne ew qursik, an jî perçeyê ku pîrîka min bi cilên min ên qetiyayî û gincirî ve didirû.

- Kerê ker! Ew tiştê te got, ji bo do û pêr bû. Bervejî vê yekê "Pîne", mirêkeke bi efsûn e, her kes rabirdû û diwaroja xwe tê de dibîne. Nemaze 'navenda civandina windayî û jibîrbûyîyan' e. Heke

te hêjahiyek xwe, li kolan û sikak û şehwetgeh û riswaxaneyên van bajarên nenas winda kir, sererast berê xwe bide vê navnîşanê; "Taxa dîroka wînda, şeqema welatê xeniqî, kolana zimanê jibîrbûyî, avahiya hunera beravajî, nimroya bînimro". Hinga tu gihîşt ber derî, bila ev bûyerên ne-asayî tirs û fikaran li dilê te bîzar nekin. Bê tirs derî veke, tu dê navnîşaneke berevacî navnîşana li derve, li wê derê bibînî. Berî ku tu bêje 'rojbaş', berê xwe bide qedemgehê û li mirêkê bimeyzîne, tu dê rûyê xwe yê wînda, cara yekem, di mirêkê de bibînî...

ku hûn ewqas mêr û jin hatine ba hev, ji we nayê ku di 7 rojan de pîneyekê çêkin, di gel van teknîk, derfet û vê pêngava germ de, meriv dikare her roj pîneyekê derxe.

Ji bo ku Pîne bibe heftane, em xwendevanê we, wê her derî li ba we bin. Hûn ji me çî bixwazin, hûn bêminet in. Bi salan em baş nefikirin, lê em gelekî girîyan. Divê îro em pir bifikirin û bikenin. Bawer im mîna her mirovekî/ê, mîna her gelekî, ev maf mafê me ye jî. De ka em bilezînin!..

İsmail Oldar/ Niğde



ERDOĞAN 33

Hêvîdar im ezê jî windahiye xwe di mirêka Pîneyê de bibînim. Ji bo vê mirêka kurdewarî, hûn dê di serşoka mala her kurdekî/ê de bi cih bikin. Ez spasîyên xwe ji bo we diyar dikim û di vê rêwitiya we ya sext û dûvedirêj de serfiraziye dixwazim.

H. Kovan Baqî

Hevalên Pînevan! Merheba ji we re! Bi derketina we valahiyeke me hate pînekirin. Ez ked û xebata we pîroz dikim. Lê gelekî şerm e ji we re,

Min Pîne girt. Ji bo derketina Pîneyê ez gelekî spas dikim.

Ali Baran/ Mersin

Ji Pîne re dibêjim ku bi xêr û ser seran û serçavan hatî, nav çapemeniya kurdewarî. Ji te re temenekî dirêj dixwazim û dibêjim ne tenê eş û janên gelêrî, ka were ji kerema xwe re serê min ê gurî jî pîne bike. Ma wê çî bibel?

Berken Bereb

Li min bînerê Pîna delal!

Ez kurd im, kurdistanî me
Lê ez dîroka xwe nizanim
Ji kêmahiya min re dibe pîne

Ciwan im, xwendevan im
Lê ez kurdî nizanim
Ji zimanê min re bibe pîne

Dinya ketiye nêv dijwari
Tim der bûye zîlmat û tarî
Hêviya te me ji min re bibe ronahî

Ne ji diza re ne ji pîsa re
Ne ji tîra re ne ji xiraban re
Ne ji kedxwara re ne ji xayînan re
Nebe pîne

Heval Kenan

Hey Pîneciyo!

Hevalno! Piştî min rojname xwend ku Pîne derketiye, bi pey Pîneyê ketim. Xwezî neketibûma. Hûnê bibêjin çima? Ma çima bikevim!? Min tev xwend, lê qet nekeniyam. Car caran kenê min hat, lê min bi zorê xwe ragirt. Lewma ez wekî we ji xwe re dibêjim, xebatkar, kedkar, lê ez bi eslê xwe "kuçûk birjuwa" me. Heger ez bi xwe di nava gel de bikenim, "siyasî abêtîya" min li ku dimîne!.. Min got car caran keniyam. Ji her tiştî re kenê min nehat. Jixwe me ken ji bîr kiriye. Gava dikenim, dengê min wekî orîne dertê.

Di bin ewqas zilmê de, ken zor e, qerf û henek jî zor e, îşê we jî zor e. Ji we re serketinê dixwazim.

Mamoste/İskenderîn


Xebatkarên Pîneyê yên birêz û bêrêz!

Min hejmara Pîneyê ya yekemîn xwend. Ez pir kêfxweş bûm. Dema min rûpel hêdî hêdî qulipandin, zikê min ji ber kenîne pir êşîya. Bi rastî nivîsa rûpela dawîn bandoreke mezîna li min kir. Em kurd her tim dibêjin, 'em nikarin bi zimanê xwe, xwe ifade bikin. Erê rast e... Mirovek, ku bi zimanê xwe xeber nede, nexwîne û nenivîse, wê çawa bikaribe xwe pê ifade bike? Li aliye din ji bo xwe-fadekirinê divê mirov hinekî serê xwe biêşîne.

Bi henekî be jî, gelo zabita hewce ne? Pêşîn, divê em kurd bibin zabitayên xwe, ango ziman, pênuş û mêtîyê xwe bi zimanê xwe bixebitînin. Hêvîdar im di demeke nêzik de, wê kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û bi vî awayî jî Pîneyê bixwînin. Ji we re çivanokek. Li ser hev, bi derbekê bixwînin:


Çûme mala mamê mela Remezan
Mi gote jina mala mamê mela Remezan
Kanê mera mala mamê mela Remezan

Mazlûm Jiyan/Wan



BUROKRASÎ

İMAM CİGİ



BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Hûn îro pir kêfxweş in. Lê van rojan, qeşmerek li dû we digere. Qet rû nedinê. An na, ew ji wê wekî Silêman Demirel li serê we bibe bela. Hûnê nikarin di sala nû de, ronasekê di jiyana xwe de pêk binin. We dît ku hûn nikarin jê xelas bin, gazî merivekî xwe yê diyarbekirî bikin.

QUŞXANE Ên berî nîvro...



Bêhna we îro pir teng e. Îçlikekî sor li xwe kin. Belkî bêhna we hinekî fireh bibe. Piçekî ji dimsê bixwin. Hûn çend hêkan jî bavêjinê, wê xwestir bibe. Tu eleqa îçlike sor, hêk, dims û bêhna we ya teng bi hev ve nîn e, lê ji ber ku hûnê tev li civînekê bibin, îşev nokan nexwin.

MOZ Ên bûna wan ne diyar




Hûn miroveke pir jîr û biaqil in. Yanî we aqlê xwe bi nan û otî penêrê Wanê nexwariye. Jixwe hûn nikarin bixwin ji. Ji ber ku otî penêrê Wanê pir buha ye. Hevalên xwe bi bîr binin û rahêjin telefonê. Piştê wekî tedbîr, ji xwe re maleke din, heta bajarekî din bibînin. Lewre mala bavê we, ne Axurê Xelo ye.

CASİK Ên ber êvarê...



Dibe ku van rojan di jiyana we de çend 'evinên artçî' çêbibin. Lê netirsîn, hûn ji evîna mezin a bi talûke, bê qeza û bela derbas bûne. Ew evîna ku çavan kor, guhan ker û dest û lîngan pûç dîke û laşê mirov dîke kavi, di sih û çil salan de carekê çêdibe. Lê heke hûn, li ser faya evîndariyê bin, ev sih û çil sal, dibe ku bibe sih û çil meh an jî sih û çil roj û çil saet.

ZIRNE Ên nivê şevê...



Dibe ku van rojan hûn hinekî bixwazin bi tenê bimînin. Bijî. Ev tiştê baş e. Tenêmayîn carina ji bo rihê mirov tiştê pêwîst e. Lê hûnê bi tena serê xwe çî bîkin? Xwestina we ya tenêmayînê, li gorî min, hinekî qeşmerî ye. Kundîrek jî di bostên de digihêje. Lê biborin, we ji kundîrê re jî wê de here. Li çara serê xwe binêrin.

HUDHUDK Ên heft mehî hatine



Li pêşiya we dawetek heye; ya hûnê bizewicin û ya wê diya we bizewice. Sebra we hatiye ber qirikê. Ku hûn bizewicin ji xwe hûnê kêfxweş bibin û bavê we jî ku li erdehekê rast neyê, wê temenkî dût û dirêj derbas bike. Ku hûn nezewicin, ihtimalekî mezin, hûnê ji qehran bavê xwe bikujin û dawiyê wê diya we bizewice. Ji ber wê jî rûnî û bi bavê xwe re pipeyivin.



KOVARA PANZDEROJÎ (ONBEŞGÜNLÜK DERGİSİ)

- Xwedî (İmtiyaz Sahibi) M. Nuri KARAKOYUN
- Gerîndeyê Giştî Mazlum DOĞAN
- Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran
- (Yazı İşleri Müdürü) Abdurrahman PEKEDİS
- Kargerê Giştî (Genel Müdür) Seyit KARABAŞ
- Rûpelsazî A. RAHMAN ÇELİK
- Navnîşan (Yönetim Yeri) İstiklal Cad. Ayhan Işık sokak. 19/1 Beyoğlu/ İstanbul
- Tel: 212 2927270
- Fax: 212 251 95 85
- Kargerî (İdare)
- (212) 245 16 50
- Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A. Ş.
- Yayın Koordinasyon Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
- Belavkirin BIRYAY DAĞITIM
- Nûnergeha Amedê Tel: (412) 223 34 83

Ji Aşxaneyê Pîneyê re, Ji Ferhengê ku Enstituya Kurdî amade dîke çend bêje:

erdhej: osman nesekînî
 rojev: pêvajoya dawîya dawîn
 gur: têne kedîkirin
 pêşniyar: bêje û bireve
 komar: çêleka têr şîr
 çarenûs: serwîsa xwe bi xwe
 rexne: zûkayî bikuje
 xwerexne: li ber destê papaz guneh daweşandin
 girav: cihê İsa
 zanistî: penîrê koçeran
 xeflet: nayê xuyakirin
 demokratîk: kiş û mat
 şêr: xwedê sebr bidê
 sazî: cihê rûniştinê
 şer: sînemaya hate hilanîn
 civîn: dilrawestin
 Aştî: vê gavê navê biraziyê min e
 pêvajo: şekirê qulo qulo
 ferheng: axx...axx...axx...
 encam: şopa tiliya nehêle
 Pîne: Apê Musa li we mêze dîke

Abdullah Koçer

pîne

NALET LI
TEKNOLOJİYÊ BÊ !
EZ BEHECÎM...
LÊ ÇI DIBE BILA BIBE EZÊ
ÎŞEV LI MEDYA XWE
TEMAŞE BIKIM.

ÇAWA BÛ
KUROO!..

BELÊ BAVO
DERDIXÎNE
TE ÇAWA
ÇÊKIR

